Newroz Hejmar (78) Rûpel (6) Subat 2008z – 2619k

Du xalbalkêş di bîranîna Osman Sebrî (Apo) de

Dr.Ebdilmecît Şêxo

Beriya demekê bi bûneya bîranîna têkoşer Osman Sebrî min du berhemên hêca yên du nivîskarên jêhatî Siyamend Îbrahîm bi erebî û yê Reşoyê Pîrê bi kurdî xwendin. Herdu nivîs jî bi naverokên xwe dewlemend û nirx bilind bûn. Di vir de ez hezdikim du xalên giring yên ku li cem herdu berêzan hatine jibîrkirin zêde bikim. Mîna pir kes û nemaze herdu nivîskarên me yên jorîn dizanin ku, li dawiya 1998 an de "XELATA OSMAN SEBRÎ " bi beşdarbûna gelek rewşenbîr û siyasetmedarên Rojavayê Kurdistanê li Şamê hate damezrandin.

Komîta "Xelata Osman Sebrî " biryar istandibû ku her sê salan kesayetiyeke biyanî, yê ku bi berhem û helwestên xwe yên erênî, di dermafê gelê Kurd de hatiye naskirin, ji aliyê wê ve bête xelatkirin.

Li ser vê bingehê komîta "Xelata Osman Sebrî" xelata yekem wêna têkoşer Osman Sebrî di çarçûveke zêrîn û di bin navnîşana " JI BO DOSTANIYA GELAN ", di sala 2000 î de li Anqrê pêşkêşî zanyarê civaknasiyê yê mezin Prof. Îsmaîl Bêşikcî kir. Herwisa jî, di sala 2004 an de dayika Kurdan, rêzdar Daniyal Mîtran, xanima serokê Firansa yê berê Cak Şîrak li Însituta kurdî li Parîsê hate xelatkirin. Herweha wek em dizanin ku komîta jorîn niha xelata sêhem jî amede dike û dê wê di sala 2008 an de pêşkeşî kesaytiyeke Ereb û nasdar bike.Damezrandina "XELATA OSMAN SEBRÎ " beşek ji berdewamiya jiyana APO OSMAN SEBRÎ ye, ewa nirx û
buhayê APO di nav gelê me û cîhanê de diçespîne. Lewra jî xaziya eva xala giring li nik nivîskarên me nehata jibîrkirin.

Xala duhem ev e, ku xêre pakrewanê Kurdistanê Osman Sebrî bi navê APO hati bû naskirin?

Li gor ku min ji devê nemir Hemreş Reşo yan ji devê rêzdar Prof.. Cemal Nebez bîhîstî ye, weha ye; Xanim Rewşen Bedirxan di hevdîtinên xwe bi Osman Sebrî re ji wî diprse; ma gelo ez çawa bang li te bikim? Eger ez ji te re bêjim Osman Axa tuyê ji min, vî navî nepejrînî? Vêca ez çi bêjim?

Osman Sebrî bersiva Rewşen Xanimê pir bi sanahî daye û gotî ye; hema bi min re bêje APO. Lewra, ji wê rojê ve ta niha serokê me yê nemir bi navê APO hatiye naskirin. Di vir de ez naxwazim şirove bikim ku ji bo çi ? Osman Sebrî nexwastiye bi navê Osman Axa bête bangkirin, lê di herhal de, eva helwesteke netewî û siyasî ye. Lewra, pêzanîna sedama bi navkirina Osman Sebrî bi APO jî, birek ji jiyana wî ya dewlemed û watedar e.

Almaniya 14.02.2008